HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ

# BULTENA ÇANDINIYÊ YA HDP'Ê

MİJDAR-BERFANBAR 2020 / HEJMAR: 11-12

# KOOPERTÎFVANÎ

*KOOPERATÎF ÇI YE?*

*Kooperatîf ew hevkarî ye ku pêdiviyên hevkarên xwe li beramberî hevdu, bi hevkariyê pêk tîne û diparêze; ji bo kar na lê ji bo sûda civakê dixebite, sermaye û hevkarên wê dikarin bên guhertin.*

*Her kesê li gor şert û mercên wê saziyê temsîliyeta xwe pêk bîne, dikare bibe endamê kooperatîfê. Dikare bi awayekî demokratîk tev li rêveberiyê bibe û ji xizmetên kooperatîf pêşkêş dike sûdê werbigire. Kooperatîfa bi dirûşma "her yek ji me ji bo me tevan, em tev ji bo her yek ji me" sembolîze dibe, bi hişmendiya hevkariya di nav mirovan de tevdigere û jiyana endamên xwe diparêze û dewlemend dike.*

*Xizmetên kooperatîfan berfireh in; çand, daristanî, masîvanî, kirîn, kredî, hevkarî, afirandina kar, çûn û hatin, starî, xweşî û aramî û heta pêdiviyên tibî, bi hemû aliyên jiyana me re têkildar e.*



*Fotoğraf: refleksgazetesi.com*

**500 hezar kulîlkên demsalê yên jinên di bin banê Kooperatîfa Hewla Hilberîn û Şîrketa Jinan a Mêrsînê (MERSÎNDEN KOOP) de dixebitin diçînin, ji aliyê şardariyê mezin ve li park, baxçe û refujan tên çandin. Seroka kooperatîfê Meral Seçer, destnîşan kir ku wê koopertîf bi demdirêjî bandorê li jiyana gelek jinan bike, bi hilberînê wan bihêz bike û wê sûdê li bajêr bike. Seçer diyar kir ku jinên kulîlkan hildiberînin, bi xebatên xwe yên di bin banê kooperatîfê de dikin dibin sedem ku hevkariyeke mezin derkeve holê.**


# KOOPERATİF İLKELERİ

***1. Endamên xwebexş û endamtiya zelal***



Kooperatîf rêxistinên xwebexş in. Derê wan ji yên bixwazin ji xizmetên wan sûd bigirin û yên dikaribin berpirsiyariyên hevpar bi cih bînin re vekirî ye (zayend, nijad, ol û cudahiya polîtîk ne girîng e ji bo kooperatîfê). Şirîk kengî bixwazin dikarin ji şirîkiyê derkevin.

***2. Rêvebiriya demokratîk û venêrîn***



Her şirîk xwedî heman mafê dengdanê ye û di mijara mekanîzmayên biryardayinê de wek hev in. Her şirîk çiqas razan li kooperatîfan kiribe jî di mafê dengdanê de tenê xwedî yek dengî ye. Jin û mêrên bijartî di şirîkbûnê de wek hev berpirsiyarî digirin.

***3. Tevlîbûna aborî ya endaman***



Şirîk ji bo kooperatîfan jêderên ku di destê wan de ne (pere an mal) parve dikin. Biryara bikaranînên diravên kooperatîfan bi şiklekî demokratîk tê girtin. Di biryargirtinê de bandora mîqdara razandinê tune ye. Dahata ji kooperatîfan tê, ne li gor diravên şirîkan li gor karên ku tê kirin diyar dibe.

***4. Xweserî û serxwebûn***



Kooperatîf ji hêla rêveberiyê ve xweser in, xwe bixwe bi rêve dibin û ji aliyê şirîkên xwe ve tên kontrol kirin. Ku kooperatîf bi hikûmet an jî bi saziyên din re peymanan çêbikin yan jî ji jêderan diravan bi dest bixin, van kirinan bi şiklekî demokratîk di bin kontrola endamên xwe de û bi parastina xweseriya kooperatîfan dikin.

***5. Perwede, hîndekarî û zanîn***



Kooperatîf perwerde û hîndekariyê ji bo pêşketina kooperatîfan dide endam, nûnerên bijartî û xebatkarên xwe. Kooperatîf raya giştî (bi taybetî jî ciwan û pêşengên rûspî) der barê kar û feydayên wî agahdar dike.

***6. Hevkariya di navbera kooperatîfan de***



Kooperatîf; bi şîrket û hêzên herêmî, neteweyî û navneteweyî ji bo şirîkên xwe xizmeta herî bi hêz û bandordar bikin bi dezgeyên neteweyî û navnetewî re dixebitin.

***7. Hestyariya civakê***



Armanca kooperatîfan ew ku bi polîtîka û faaliyetên ji aliyê şirîkên wan ve hatine qebûlkirin, pêşketina bi berdewamî ji bo civakê pêk bîne.

## KOOPERATÎF

- ✤ Kooperatîf modeleke demokratîk a bikêrhatî ye ku mafên kesên kêmhêz diparêze.
- ✤ Kooperatîf li ser alîkariya jixweber, berpirsiyariya cewherî, demokrasî û ji nirxên wekheviyê hatiye avakirin.
- ✤ Bingeha kooperatîfan piştgiriye.
- ✤ Kooperatîf saziyên xwebexş in û ji her kesê re vekirî ne.
- ✤ Kooperatîf ew sazî ne ku ji aliyê endamên xwe ve tên birêvebirin, polîtîkayên xwe bixwe diyar dikin û biryarên xwe bixwe digirinin.



Fotoğraf: istesob.org.tr

***Eğitim çağındaki çocukların kooperatifçilik bilincinin artması amacıyla Esnaf, Sanatkârlar ji bo pêşketina li ser kooperatîfan, zarokên di temenê xwe yê perwerdeyê de ne Midûryeta Kooperatîfvaniyê ya Bazirgan û Sinatkaran, îsal cara yekem pêşbirka wêneyan li dar xist. Rana Kuçuk di pişbirkê de bi wêneyê xwe yê li ser hêmanên kooperatvanî, beşdariya aborî, xweserî-serxwebûnê, feydeya civakê û xwebexşiyê çêkiribû li navenda Stenbolê bû yekem.***

## CUDAHIYA KOOPERATÎF Û ŞÎRKETAN

***Kooperatîf jî wek bankayê kredî dide, kooperetîfa berxweran her wiha wek marketekê mal difiroşe mişteriyên xwe. Nexwe cudahiya di navbera kooperatîf û şîrketan de çi ye?***

### KOOPERATÎF

Bi rêxistinbûna endaman, fêdeya wan li ber çavan tê girtin.

Armanca bingehîn parastina endaman a li dijî sermayeya mezin e.

Ji bilî hin îstîsnayan hevkarî ji bo her kesî vekirî ye.

Endamên kooperatîfan bi qasî ku karê bi kooperatîfan re kirine behra xwe distînin.

Hemû endam bi hev re biryaran didin.

Tişta diyarker piştevanî û keda endaman e.

### ŞÎRKET

Bi yekitiya sermayeyê armanca bingehîn mişterî ne.

Armanca bingehîn zêdekirina destkeftiyên sermayeyê e.

Her kes nikare bibe hevkar.

Xwediyên sermayeyê li gor pişka xwe behrê distînin.

Biryar li gor rêjeya pişkê diyar dibe.

Tişta diyarker sermaye ye.

## LI CÎHANÊ KOOPERATÎFVANÎ



✤ *êdetirî %12'yê mirovahiyê parçeyek ji 3 milyon kooperatîfên cîhanê ye.*

✤ *Li gor World CooperativeMonitorê ( 2019) 300 kooperatîfên mezintirîn û hevkaran 2,034,98 milyar USD cîro bi dest xistine.*

✤ *Bi saya kooperatîfan aborî bi berdewamî mezin bibe û îstihdama biîstiqrar û biqelîte pêk tê. Li tevahiya cîhanê bi piranî li çandiniyê, 280 milyon kes li kooperatîfan îstihdam dibin; bi gotineke din ji sedî 10'ê tevahiya îstihdamê li kooperatîfan e.*

✤ *Li cîhanê hejmara kooperatîfan 2,94 milyon, ya endamên hemû kooperatîfan 1,217,5 milyon e.*

✤ *Li tevahiya cîhanê daneya kooperatîfan ya salane, bi qasî % 4,3 dahata kurewî û ya navmalî ye û 2,98 trilyon dolar e.*

✤ *Li Zelandaya Nû, Holanda, Fransa û Fînlandiyayê ji % 10'an zêdetirê dahata neteweyî ji hêla kooperatîfan ve hildibere.*

✤ *Li Ewropayê zêdetirî ji %17'ê nifûsê hevkarê kooperatîfekê ye.*

✤ *Dema ku em li gor hejmara koooperatîfan lê binerîn kooperatîfên herî zêde di beşa senayê û xizmetê de ye; li gor hecma karê salane beşa çandiniyan li pêş e.*

✤ *Li Îtalyayê %50 sektora çandiniyên xwirekan ji hêla kooperatîfan ve tê birêvebirin.*

# LI TIRKIYEYÊ KOOPERATÎFVANÎ

## Niha Li Tirkiyeyê 30 cureyên cuda hene:

✤ 53.259 kooperatîf, 536 yekitî hene.

✤ Hejmara hevkarên kooperatîfan ên qeydkirî 7.422.994 e.

✤ Ji %10'ê nifûsa welêt hevkarê kooperatîfan e.

✤ 3 wezaretên berpirsiyarên kooperatîfan hene.

**1.** Wezareta Bazirganî û Gumrikê

**2.** Wezareta Çandinî û Daristanan


**3.** Wezareta Bajarvanî û Hawirdorê

✤ Sê yekitiyên herî zêde endamên wan hene;

**1.** Bi 963 kooperatîfan re yekitiya kooperatîfan a kefaleta krediyan


**2.** Bi 644 kooperatîfan re Yekitiya Kooperatîfan a Barkirinê.

**3.** Bi 322 kooperatîfan re Yekitiya Kooperatîfên Firotinê ya Çandiniyê.





*Grafîk-1. Li gor wezaretan belaviya rêjeyî ya hejmara cureyan (%)*

- *Wezareta Bazirganî û Gumrikê*
- *Wezareta Çandinî û Daristanan*
- *Wezareta Bajarvanî û Hawirdorê*




*Grafîk-2. Li gor wezaretan belaviya hejmara hevpar a kooperatîfan (%)*

- *Wezareta Bazirganî û Gumrikê*
- *Wezareta Çandinî û Daristanan*
- *Wezareta Bajarvanî û Hawirdorê*




*Grafîk-3. Belaviya li gor cureyan a kooperatîfên endamên yekitiyê*

- *Yekitiya Koperatîfên Kefîlîyê Ên Krediyê*
- *Yekitiya Kooperatîfên Kişandinê.*
- *Yekitiya Koperatîfên Firotinê Ên Çandinê*
- *Yekitiya Din.*

# LI TIRKIYEYÊ KOOPERATÎFVANÎ

Kooperatîfên Firotinê yên Çandiniyê di bin banê 17 yekitiyan de kom bûne û 13 jê hê çalak in. Hejmara endamên kooperatîfan 336, tevahiya hejmara hevkaran 547.343 ye.

| Yekitî | Hejmara Kooperatîfan | Hejamara Hevpar | Hejmara Nîvekî ya Koop. |
|---|---|---|---|
| YekitiyaAnt | 6 | 5.634 | 939 |
| YekitiyaÇûko | 34 | 34.857 | 1.025 |
| YekitiyaFîsko | 50 | 215.810 | 4.316 |
| YekitiyaGul | 6 | 8.928 | 1.488 |
| YekitiyaKarazadeniz | 19 | 37.319 | 1.964 |
| YekitiyaKoza | 5 | 3.327 | 665 |
| YekitiyaMarmara | 8 | 29.414 | 3.676 |
| YekitiyaTiftik | 12 | 19.789 | 1.649 |
| Trakyabirlik | 48 | 44.780 | 933 |
| Yekikit Hêjîran a Tarişê | 15 | 3.841 | 256 |
| Yektiya Pembo ya Tarişê | 44 | 35.603 | 809 |
| Yekitiya Trî ya Tarişê | 14 | 10.610 | 757 |
| Yekitiya Zeytûn-Zeytê ya Tarişê | 32 | 23.885 | 746 |

***Cedwel: Hejmara mezinbûna yekitiyên çalak***

# Kooperatîf li welatên cuda di dema pandemiyê de çi dikin?

Rêxistina Xebata Navneteweyî (ILO), em di dema krîzê de mînakên herî baş ên hevkarî, piştgirî û hevparîbûnê dijîn. Di van demên bi vî rengê de, piştgiriya endamên kooperatîf û cîroyê ev şop tê xuyakirin. Di krîza maliyeya global a di salên 2007-2008'an de jî û di 2001'ê de krîzê de ku li Arjantînê bû jî rewş ev bû. Di pêvajoya pandemiyê de jî ev rewşa piştgiriya kooperatîfvaniyê dîsa derdikeve pêş.

## ÎTALYA

Yekitiyên Kooperatîfên Îtalyayê, bi saziyên şîrket û sendîkayan temsîl dikin re bi hemahengî, ji bo diyarkirina tedbîrên desteka aboriyê pêşniyariyên xwe pêşkêşî hikûmetê kirin. Di 16'ê adarê de lijneya wezîran biryarnameyek bi 25 milyar euro pesend kir, ji vî 25 milyar euroyî 10 milyar euro ji bo piştgiriya aboriyê hat veqetandin.




*Fotoğraf: wantedinrome.com*

***Kooperatîfên taksîvanên îtalî di dema koronayê de ji bo kesên temenê wan di ser 65'î de, xizmeta bêheq pêşkêş kir.***

Kooperatîfan ji bo kesên temenê wan di ser 65'î de, xizmeta teslimata bêpere ya marketê pêşkêş kirin. Şebekeyên piştgiriyê ji bo kesên ku bi tena serê xwe dijîn dest bi alîkariyê kirin. Kooparatîfên ji herêmên cuda yên Îtalyayê ji bo parastina ji koronayê dest bi çêkirina maskeyên bi qumaşên teybet kirin. Maske ji kooparatîfên mehkûmên berê, bengiyê maddeyên hişbir, koçber û yên hewceyê alîkariyê ne tên çêkirin.




*Fotoğraf: sosyalekonomi.org*

***Ev afîş tevî sînordarkirinên lojîstîk ên li Ewropayê, hevkariya têkoşîna li dijî Covîd-19'ê ya kooperatîfên bulgaristanî û îtalyanî nîşan dide.***

Kooparatîfên Berxwiran ên Îtalyanî (Coop Italya), ragihandin ku bi qasî du mehan wê zem neyê ser 18 hezar berheman. Coop Îtalya ji bo extiyar û yên hewceyê alîkariyê ne mal belav kirin. Wekî din Coop ji şirîkên xwe yên Hong Kongê teslîmata kel û pelên tibî organîze kir. Ev bi saya şîrketa wan a standinê Coop Eastê hat kirîn. Coop bi vê qenalê ji bo xebatkarên xwe û xebatkarên giştî kel û pelan kirîn.

Navenda Vaqfa Xebatê ji bo xebatkarên sektora kêf û şahiyan a ne di rojeva hikûmetê de bûn xebatek kirin û bi 47 hezar îmze ji bo sê mehan tezmînat ji bo wan ji hikûmetê girtin.

## HÎNDISTAN

Li Hîndistanê kooperatîfên hunermendan zêdetirî 500 hezar maske firotin. Ji xeynî vê kooperatîfan bi bandora xwe ya fireh mirovên hewceyê alîkariyê ne bi rêveberiyên xwecihî re anîn cem hev.

## ÎSPANYA

Kooperatîfên Îspanyol ji bo sektora tibî 10 milyon maske çêdikin.




*Fotoğraf: www.marca.com*

***Qaptanê Klûba Barselonayê (yê çepê li serî rûniştî ye) ya taximeke fotbolê ya kooparatîfê Lionel Messi, ragihand ku wê ji mûçeyê lîstikvanan ji sedî 70 alîkarî bidin ji bo têkoşîna li dijî Covîd-19'ê.***

# KOOPERATÎFVANIYEKE DIN PÊKAN E

*Nivîskar: Ridvan TURAN - Berdevkê komisyona çandiniyê – Parlamenterê HDP yê Mêrsînê*

Yek ji zirarên herî mezin ên 12'ê îlonê çêkir bêguman, pêşîgirtina li birêxistinbûnê û qelskirina baweriya pê bû. Vê yekê bandoreke neyînî li komeleyên sendîkayan, partiyên siyasî û ji wan saziyan zêdetir li kooperatîfan kir. Kooperatîfên ku bi sedhezaran hilberînerên wan hebûn hatin girtin an jî rasterast xistin bin fermana îradeya siyasî. Van tiştan zirareke mezin da kooperatîfan, lê belê van hemû êrîşan, bi qasî fikra li hemberî kooperatîfbûnê yê xistin serê girseyên mezîn, zirar neda kooperatîfan. Wiha bû ku ji dema darbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê ve û heta niha ji bêewlebûna kooperatîfan û îdiayên kesên rêveberiya wan dikirin ji bilî siberoja xwe tiştekî din nedifikirîn, ev qad ji aliyê bîrdozî ve qels kirin. Ev bû sedem ku hilberîner bi guman li kooperatîfan binêrin û xwe ji wan dûr bixin.

Niha di warê kooperatîfvaniyê de em hewldanên nû dibinin, lê belê hewldanên ku bi niyetên baş dest pê dikin, qismek jî wan a zêde bêyî ku encam bigire, di demeke kin de bi dawî dibin. Ji çanda xebata hevpar dûr ketin, qelsbûna hevgirtina civakî, mewzûat û sekna karîgeriyan a li hember kooperatîfan, dibe sedem ku mirov ji hewldanên avakirina kooperatîfan poşman bibin.

Her çi dibe bila bibe, em dizanin ku heke em di serî de di qada çandiniyê de û di her qada jiyanê de çanda bi hev re karkirinê û bi piştegiriyê li piya mayînê pêk neynin, em ê nikaribin jiyaneke alternatîf ava bikin. Ji ber vê tespîtkirina pirsgirêkan, ji bo sererastkirina wan vesazkirina mewzûatê, zêdekirina pratîkên encamgir gelek girîng e.

Li Tirkiyeyê kooperatîfvanî bi gelek pirsgirêkan re rûbirû ye. Divê kooperatîfvanî bi feraseta ku hemwelatiyan li ser bingeha wekhevî, demokrasî, tevlêbûnê bîne gel hev. Feraseteke ku cudaxwazî û rikberiyê xurt nake esas bigire. Ya herî girîng jî divê li pêşiya rawşa ku kooperatîf di nav piyaseyê de diguherin şîrketan bê girtin û feraseta ku ew rêxistinên gel û kedkaran in, were xurtkirin

- Divê pêşiya azadiya birêxistinkirnê vebibe, wesayeta îdareya burokratîk were rakirin.
- Divê tevlêbûna welatiyan bi asteke adilane û demokratîk pêk were.
- Divê kooperatîf bi pîvaneke destnîşankirî û wekî saziyeke hevbeş a civatan were danasîn.
- Divê pêvajoyên rêveberiyê bi tevlêbûneke xurt û demokratîk were kirin.
- Divê her awayê pêkanînê ku bi armanca kargeriyê veguherînin teşwîqa kar û feydeyê, tên kirin, werin astengkirin.
- Divê pêşiya avakirina kooperatîfan û hêsankirina hevkariya di navbera kooperatîfan de were vekirin û divê fêdeya cemaweriyê wekî bingeh were dîtin û bace kêm bibin.
- Divê pêvajoya avakirina kooperatîfan, bi tevlêbûneke xurt a nirxandinê û bi rengekî demokratîk were pêkanîn. Her wiha divê qad û çarçove û berpirsiyarî bi rengekî zelal were danasîn.
- Divê pêvajoyên damezrandina yekîneyên jorîn werin hêsankirin.
- Divê yekeyek, wezareteke taybet a koperatîfan were damezirandin.

# KOOPERATÎFVANIYEKE DIN PÊKAN E

## PÊŞINYARÊN TÊKILDARÊ KOOPERATIFVANIYÊ

*Nivîskar: Ridvan TURAN - Berdevkê komisyona çandiniyê – Parlamenterê HDP yê Mêrsînê*

**1**

*Divê ku Kooperatif saziyên xwerêveberiya demokratîk bin, lê belê çi ji ber mewzûatê çi jî ji ber teserûfa îradeyê kooperatîf veguherîne sazûmaniyên birokratîk.*

*Lê hewceye ku zextên li ser kooperatîfan ên burokratîk, navendî û wesayeta antîdemokratîk were rakirin. Têkiliyên kooperatîfan ên bi şirîkên xwe re, têkiliyên bi rêxistinên di ser xwe re û şixulînê di nav xwe de li gor rêgezên demokratîk di ber çavan de were derbaskirin û ji nû ve were sazkirin. Divê rêgeza paşvekişandinê bikeve mewzûatê.*

**2**

*Divê kooperatîf ne wekî karsaziya tekakesî ya bazirganî bi armanca kar were destgirtin lê "divê wekî saziyên ji bo feydeya cemaweriyê were destgirtin". Heke mirov ji vî alî ve lê mêze bike, divê çarçoveya mijara efûkirina ji bacê were berfirehkirin û divê baştir were xêzkirin. Divê bazirganî di cemaweriyê de wiha were destgirtin.*

**3**

*Divê kooperatîf di qada xebata sê wezaret û sê mewzûatên cuda de xebatên xwe bimeşîne. Ev rewş ji alî rayeyan ve dibe sedema tevliheviyê û li pêşiya hilberînerên ku dixwazin li gor mewzûatê tevbigerin dibe asteng. Ji bo xilasiya ji vê tevlihevbûnê hewcehî bi avakirina Wezareta Kooperatîfan, yekdestkirina mewzûatan, bi şiklekî ku dikaribe hemû kooperatîfan bi hev ve gire bide, were sazkirin.*

**4**

*Weseleyên sereke yên kooperatîfan yek jê fînans e. Kooperatîf ji ber ku krediyan nabînin bi îpotekirina malên xwe rûbirû dimînin. Kooperatîfên ku kredî didin jî bûne wek selefxurên mehelî. Kooperatîfên ku rêxistina xwe ya raser temam nekirine jî nikarin kredî bibînin. Kooperatîf ji bo pêdiviya krediyan, ji ser rêxistinên raserên kooperatîfên krediyan, hewcehî bi bankayek di şiklê kooperatîfan de heye.*

**5**

*Ji bo ku xebitîna navendî demokratîktir bibe ji derveyî lijneya giştî, meclisek kooperatîfan were avakirin ku dikaribe xebitîna navendî venêre û mekanizmaya biryardayînê damezirîne. Meclisa kooperatîfan di nav du lijneyên giştî de bibe kooperatîfa rayedar. Derê meclisa kooperatîfan ji şirîkê wê re vekiriye. Meclis bi biryarên li lijneya giştî hatine girtin, xebitîna kooperatîfan guncav dihêle, kooperatîfê ji alî biryargirtinê ve çalaktir dike. Ji nav meclisê lijneyek rêvebirinê were hilbijartin û ji nav kooperatîfê lijneya giştî û seroktiya lijneya giştî jî bê rakirin.*

**6**

*Divê mafê hizûrê were rakirin. Mafê hizûrê yê fermî, kooperatîfa vediguherîne şîrketan, pêvajoya biryardayînê tenê dike bin însiyatîfa komek rêveberan û kooperatîfvan profesyonel dike.*

**7**

*Divê rêgezên kar û rîstûrnê ji nû ve werin sazkirin. Mijareke taybet a kooperatîfan ji şiklê şîrketan derbixe, ji rewşa xwe ya di binyada di nav piyasê de ya bi kar û reqabetê xilas bibe. Kooperatîf di dewsa wî de bi mekanizmayên ji xebata wekhev re muçeyê wekhev, destheq û buhê adil bên pênasekirin.*

**8**

*Divê qadên faaliyetên kooperîtîfan bên berfirehkirin. Divê pêşiya wan bê vekrin da ku hemwelatî dikaribin di her qadê kooperatîfan vebikin; her hemwelatî di qada dixebite yan jî di qadeke din de dikaribe –bi kooperatîfên cuda- bibe hevkar; divê pêşiya birêxistinkirinê bê vekirin.*

**9**

*Divê astengiyên li pêşiya kooperatîfên dixwazin hevkariyên cuda saz bikin, bên rakirin.*



HDP Genel Merkez
Adres: Barbaros Mah. Büklüm Cad. No: 117 06680
Çankaya/Ankara

@HDPgenelmerkezi
www.hdp.org.tr

HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ